# WÊNESAZÎ

## SERETAYÎ

## 3

2019/2020

## AMADEKAR

**Ev pirtûk ji aliyê Komîteya Wênesaziyê ve hatiye amadekirin.**

## LÊVEGER

**- Komîteya Şopandinê**

**- Komîteya Fotoşopê**

**- Komîteya Redekteyê**

**Ev pirtûk ji aliyê Saziya Minhacan ve, wek pirtûka wanedayînê, ji bo dibistanan hatiye pejirandin.**

# NAVEROK


BEŞA YEKEM ... 7
WÊNESAZÎ ... 7
XUYANG ... 8
AFIRANDINA TEŞEYÊN CUDA ... 9
HESP ... 10
BEQ ... 11
BERX ... 12
ÇENTE ... 13
TIRIMBÊL ... 14
HER ÇAR DEMSAL ... 15
JI MAMOSTEYÊN XWE HEZ DIKIM ... 16
BEŞA DUYEM ... 17
KARÊ DESTAN ... 17
DARA SERSALÊ ... 18
PÊNÛSDANDK ... 20
XEMILANDINA PÊNÛSÊ ... 22
MÊŞA HINGIV ... 24
KESKESOR ... 26
GILYAZ ... 28
SEBZEYÊN JI KOLACÊ ... 30
BEŞA SÊYEM ... 33
KARÊ JI HEVÎR ... 33
ZEMBÎL ... 34
TABLOYA RENGAN ... 36
TÎP ... 38
MIJAREKE SERBEST ... 40



# BEŞA YEKEM


## WÊNESAZÎ

1. **XUYANG**
2. **AFIRANDINA TEŞEYÊN CUDA**
3. **HESP**
4. **BEQ**
5. **BERX**
6. **ÇENTE**
7. **TIRIMBÊL**
8. **HER ÇAR DEMSAL**
9. **JI MAMOSTEYÊN XWE HEZ DIKIM**

## WANE 1

# XUYANG

Xuyang hunerek e, ku dûrbûn, nêzîkbûn û qebareya gewdeyan ji me re dide xuyakirin, ango gewdeyên nêzîk mezin xuya dibin û yên dûr biçûk xuya dibin.




**RAHÊNAN:** Piştî ku me cudahiya xêzkirina gewdeyên nêzîk û dûr di rêya xuyangê re nas kir, ka niha em bi hev re, dîmenekê li ser lênûsa wênesaziyê, nîgar û rengîn bikin.

WANE 2


## AFIRANDINA TEŞEYÊN CUDA

Em dikarin ji tîp, jimar, teşeyên geometrîk û hwd, teşeyên cur bi cur biafirînin.

**1** Me ji tîpa "F"yê masiyek saz kir.



**2** Me ji jimara 1`ê hêştirgayek saz kir.




**3** Me ji teşeyên geometrîik (sêgoşe û girover) Baba Niwêl nîgar kir.



WANE 3

# HESP

Hesp lawirekî xweşik e, ku berê ji bo çûn, hatin û barkirina tiştan dihat bikaranîn. Em ê ji tîpa "h"yê hespekî saz bikin û paşê em ê rengîn bikin.





**RAHÊNAN:** Wênesazê/a jêhatî, hespekî li gor van gavan bi tîpa "h"yê li ser lênûsa wênesaziyê saz û rengîn bike.

**WANE 4**

# BEQ

Beq, lawirekî bejavî ye. Ka em bi hev re, gav bi gav, bi alîkariya girover û nîvgiroverê, beqekê nîgar û rengîn bikin.





**RAHÊNAN:** Wênesazê jîr, beqekê li gor van gavan li ser lênûsa wênesaziyê nîgar bike û paşê rengîn bike.

**WANE 5**

## BERX

Berxik lawirekî kedî ye, mirov dikare ji hirî, şîr û mastê wî sûd bigire. Em ê di vê waneyê de, bi alîkariya girover û xêzên pêldayî, fêrî nîgarkirina berx bibin.





**RAHÊNAN:** Piştî ku me awayê xêzkirina berxik li gor gavan nas kir. Ka em bi hev re, berxikekî li ser lênûsa wênesaziyê nîgar bikin û paşê rengîn bikin.

## WANE 6

# ÇENTE

Çente, ji bo bicîkirina pêwistiyên kesayetî û pêdiviyên dibistanê pir giring e. Ka em bi hev re, çenteyekî bi alîkariya çargoşe û milkêşê, nîgar û rengîn bikin.





**RAHÊNAN:** Wênesaza/ê pêşerojê, hewil bide ku tu li gor van gavên li jor, çenteyekî li ser lênûsa wênesaziyê xêz bikî û paşê rengîn bikî.

WANE 7

# TIRIMBÊL

Tirimbêl ji belavtirîn navgînên çûn û hatinê ne. Di vê waneyê de, em ê bi alîkariya xêzeke pêldayî û du giroveran, fêrî xêzkirina wê bibin.





**RAHÊNAN:** Wênasazê/a zîrek, ka em li gor van gavan tirmbêlekê li ser lênûsa wênesaziyê saz û nîgar bikin.

WANE 8

# HER ÇAR DEMSAL

Sal, çar demsal in û her demsalek taybetiyeke wê heye. Di demsala havînê de gerimahî zêde dibe, di payîzê de pel hişk dibin û hildiweşin, di zivistanê de serma ye û berf û baran dibarin û di biharê de giya şîn tê û kulîlik dipişkivin.



**RAHÊNAN:** Piştî ku me nas kir di her demsalekê de çi guhertin çêdibin, ka em bi hev re her çar demsalan li ser lênûsa wênesaziyê bi rêya rengan, diyar bikin.

## WANE 9

# JI MAMOSTEYÊN XWE HEZ DIKIM

Mamosteyên me, bi zanîna xwe rêya me ronî dikin û me fêr dikin. Di vê waneyê de, em ê hewil bidin ku di rêya nîgarkêşiyê re, hezkirina xwe ji mamosteyên xwe re bidin diyarkirin.



**RAHÊNAN:** Wênesazê zîrek, ka em bi hev re nîgarekê xêz bikin ku em tê de hezkirina xwe ji mamosteyên xwe re diyar dikin û paşê em rengîn bikin.



# BEŞA DUYEM

## KARÊ DESTAN

1- DARA SERSALÊ
2- PÊNÛSDANK
3- XEMILANDINA PÊNÛSÊ
4- MÊŞA HINGIV
5- GILYAZ
6- SEBZEYÊN JI KOLACÊ


**WANE 1**

## DARA SERSALÊ

Ji bo pêşwazîkirina sala nû, dara sersalê tê amadekirin. Ka em bi hev re gavên çêkirina dara sersalê, bi rêya tewandina pelikan re, nas bikin.



**Amûrên Pêwîst:** peleke kesk, peleke pirteqalî, pênûsa risas, cawbir û şîrêz.





**RAHÊNAN:** Wênesaza/ê behremend, ka em dareke sersalê bi hev re saz bikin û bixemilînin.


## WANE 2

# PÊNÛSDANDK

Di vê waneyê de, em ê fêrî sazkirina pênûsdankê bibn, da ku em amûrên xwe yên dibistanê (pênûs, rastkêş, jêbir…) tê de bi cih bikin.



**Amûrên Pêwîst:** peleke sor, peleke kesk, peleke zer, kertoneke spî, pênûsa risas, cawbir, şîrêz û jêbir.





**RAHÊNAN:** Piştî ku me çêkirina pênûsdankê gav bi gav nas kir, ka em niha bi hev re pênûsdankekê çêbikin.


WANE 3

## XEMILANDINA PÊNÛSÊ

Em dikarin ji bo xemilandina pênûsa xwe gelek teşeyên xweşik çêbikin. Ka em bi hev re pênûsa xwe bixemilînin.



**Amûrên Pêwîst:** peleke sor, peleke kesk, peleke zer, kertoneke spî, pênûsên rengîn (kesk û sor), pênûa risas, cawbir û şîrêz.





**RAHÊNAN:** Wênesazê/a biçûk, piştî ku me çawaniya sazkirina xemla pênûsê nas kir, ka niha em ji bo xemlandina pênûsa xwe teşeyekî çêbikin.


WANE 4

# MÊŞA HINGIV

Mêşa hingiv, hingiv ji tozika gulan çêdike. Ka em bi hev re fêrî çêkirina mêşa hingiv bibin û paşê em ê wê wek lîstokekê bi kar bînin.



**Amûrên Pêwîst:** peleke spî, peleke zer, peleke reş, pênûsa risas, penûsên rengîn (reş û sor), cawbir, şîrêz, du qetên ta û jêbir.




**RAHÊNAN:** Piştî ku em fêrî sazkirina mêşa hingiv bûn, ka em bi hev re mêşeke hingiv saz bikin.

## WANE 5


# KESKESOR


Keskesor diyardeyek xwazayî ye, asîmanê me dixemilîne û xweşiktir dike. Di vê waneyê de, em ê fêrî çêkirina keskesorê bibin.





**Amûrên Pêwîst:** pelên rengîn (zer, spî, binefşî, pirteqalî, şîn, kesk û sor), pênûsa risas, cawbir û şîrêz.

1


2


3


4



5


**RAHÊNAN:** Piştî ku me çawaniya çêkirina keskesorê nas kir, ka em bi hev re keskesorekê bi rengên xweşik çêbikin.


WANE 6

# GILYAZ

Gilyaz fêkiyeke havînî ye, rengê wê sor e û çêja wê miz e. Di vê waneyê de em ê fêrî çêkirina gilyazan ji pelikan bibin.



Amûrên Pêwîst: peleke kesk, peleke sor, pênûsa risas, cawbir û şîrêz.





**RAHÊNAN:** Li gorî gavên li jor, me çawaniya sazkirina gilyazan nas kir, ka em bi hev re mîna wê çêbikin.

## WANE 7

# SEBZEYÊN JI KOLACÊ

Sebze ji bo tenidurstiya me pir girîng in. Ka em bi hev re di vê waneyê de, hin sebzeyan ji kolacê saz bikin.




**Amûrên Pêwîst:** pelên kolacê (rengê sor, reş û kesk), pênûsa risas û cawbir.

1




2




3



4



5



**RAHÊNAN:** Piştî ku em fêrî gavên sazkirina sebzeyan bûn, niha em ê bi hev re hin sebzeyan bi kolacê çêbikin.



# BEŞA SÊYEM

## KARÊ JI HEVÎR

1- ZEMBÎL
2- TABLOYA RENGAN
3- TÎP
4- MIJAREK SERBEST


## WANE 1

# ZEMBÎL

Zembîl, ji bo hilgirtina fêkî û şînatiyan tê bikaranîn. Em ê di vê waneyê de fêrî çêkirina zembîleke hevîrî bibin.









**RAHÊNAN:** Me gavên sazkirina zembîlê nas kirin, ka niha em bi hev zembîlekê çêbikin.

## WANE 2

# TABLOYA RENGAN

Tabloya rengan û firçe, ji amûrên wênesaziyê yên herî giring in, ku tablo ji bo hilgirtina rengan tê bikaranîn û firçe ji bo lihevxistin û belavkirina wan tê bikaranîn. Di vê waneyê de, em ê fêrî çêkirina van her du amûran bibin.






**RAHÊNAN:** Piştî ku em fêrî çêkirina tabloya rengan û firçeya wê bûn, ka niha em bi hev re wan saz bikin.


## WANE 3

# TÎP


Di vê waneyê de, em ê fêrî çawaniya çêkirina tîpên ji hevîr, bibin.




1



2



3



**RAHÊNAN:** Piştî ku me çawaniya sazkirina tîpan nas kir, ka em bi hev re hin tîpên kurdî ji hevîr, bi rengên cuda saz bikin.

# WANE 4

## MIJAREKE SERBEST

Em dikarin teşeyên gelek tiştan ji derdora xwe, bi hevîr çêbikin. Di vê waneyê de, me teşeyên cur bi cur saz kirine.







**RAHÊNAN:** Wênesaza/ê behremend, piştî ku te gelek teşeyên cuda ji hevîr dîtin, teşeyekî ji van teşeyan hilbijêre û saz bike.

# BELAVKIRINA WANEYAN LI SER SALA XWENDINÊ

| Heftî / Meh | Heftiya Yekem | Heftiya Duyem | Heftiya Sêyem | Heftiya Çarem |
|---|---|---|---|---|
| Rezber | | | Xuyang | Xuyang |
| Cotmeh | Afirandina Teşeyên Cuda | Hesp | Beq | Berx |
| Mijdar | Çente | Tirimbêl | Her Çar Demsal | Waneyeke Serbest |
| Rêbendan | Ji Mamosteyên Xwe Hez Dikim | Ji Mamosteyn Xwe Hez Dikim | Waneyeke Serbest | Dara Sersalê |
| Berfanbar | Pênûsdank | Lêveger | Bêhinvedan | Bêhinvedan |
| Reşemeh | Xemilandina Pênûsê | Mêşa Hingiv | Mêşa Hingiv | Keskesor |
| Avdar | Lêveger | Gilyaz | Sebzeyên Ji Kolacê | Sebzeyên Ji Kolacê |
| Cotan | Zembîl | Tabloya Rengan | Tîp | Mijareke Serbest |
| Gulan | Mijareke Serbest | Lêveger | | |